



NAVEND -
Zentrum für Kurdische Studien e.V.
Navend ji bo Lêkolînên Kurdî
Center for Kurdish Studies
Centre des Etudes Kurdes
ناوهندی لێکۆڵینهوهی کوردی

Geschäftsstelle
Bomheimer Str. 20-22
D - 53111 Bonn
Tel.: +(0)228 / 65 29 00
Fax: +(0)228 / 65 29 09

Postanschrift
Postfach 74 45
D - 53074 Bonn

e-mail: info@navend.de
Internet: www.navend.de

Bankverbindung:
Sparkasse KölnBonn
(BLZ 370 501 98)

NAVEND e.V.
Konto-Nr.: 310 206 13

Daxuyaniya Çapemeniyê

Roja 24 û 25'ê cotmeha 2009'an NAVEND – Navend ji bo Lêkolînên Kurdî / NAVEND-Zentrum für Kurdische Studien e.V. di jêr navê „Bi awira diasporayê pêşveçûnên li Kurdistanê“ li bajarê Bonn ê civînek zanistî li dar xist.

Civîn di çarçoveya rêzekombûnên „Forûma Zanistê /Gotûbêjên Pisporan“ ku ji sala 2002'an ve tên li dar xistin, bi rêve çû. Ji seranserê Almanayê derdora 50 akademisyen û pispor, pîranî kesên Kurd, beşdarî civîna du rojî bûn.

Piştî xêrhatina beşdaran ji aliyê serokê NAVEND – Navend ji bo Lêkolînên Kurdî birêz Metin Incesu ve, birêz Prof. Dr. İlhan Kizilhan li ser pêwistiya hebûna „Hevgirtinek ji bo lêkolînên kurdî û ji bo pêşveçûna vekolîn û zanistê“ gotinek arasteyî beşdaran kir.

Piştî gotara Kizilhan birêzan Dr. Nebi Kesen û Dr. Naif Bezwan li ser „Siyaseta Tirkiyeyê di derbare pîrsa Kurd de û dîmensiyona wê ya heremê – pêşveçûnen aktûel û tendans“ gotarên xwe pêşkeş kirin. Piştî van gotaran, gotûbej li ser wan hatin kirin.

Êvarê pisporên Kurd Lêkolînên xwe yê nû pêşkeş kirin û encamên wan di forûmê de hatin nîqaşkirin.

Di roja duyem de birêz Dr. Awat Asadi li ser mijara „Kurdistan-Îrak û perspektîf, herwiha referandûma Kerkûkê – Ji Almanya an jî Ewropayê bi çi awayî alîkarî dikare bê kirin?“ gotarek pêşkeş kir.

Di dawiya civîna zanistî de ji aliyê akademisyen û zanyarên Kurd yê beşdar biryara damezrandina „Forûma Lêkolînên Kurdî û Transnasyonel“ / **Forum für Kurdische und Transnationale Studien (FKTS)** di bin banê NAVEND – Navend ji bo Lêkolînên Kurdî de hat girtin.

Ev forûm ji xwe re dike kar ku alîkariya projektên lêkolînî, tîzên doktora û tîzên majister di derbarê mijara Kurdan de bike û beşdariya wan di konferansên navnetewî û civînen zanistî de misoger bike. Wekî din forûm wê li ser pêwendî girêdana saziyên cuda, zan-koyên netewî û navnetewî ku bi renegekî zanistî bi mijara Kurdan re mijûl in, rawestê.

Kordînasyona FKTS wê ji aliyê birêzan PD Dr. Gülistan Gürbey, Prof. Dr. Ferhad Ibrahim Seyder, Prof. Dr. İlhan Kizilhan, Sebahattin Topcuoglu û Dr. Awat Asadi bê kirin. Malpera înternetê ya forûmê wê ji aliyê NAVEND'ê bê amadekirin. Çendîn pispor wê di malperê de pîrsên di forûma FKTS di derbarê babatên xwe de bibersivînin û amojkariya ji bo projektên vekolînî û alîkariyê bikin.

Bonn, 28.10.2009